Mirad û deftera bîrhatinan

Hişyar Rêkanî

Me gelek bîrhatin bi hev re hene.. Bigre ji seredanên me bo ser rûbarê Marik li pişta geliyê Balinda.. Zoma Sîteyiyan. Dîsan bo gundê Boselê Barzana biçûk.. Wargehê Sindiyan.. Her wesa demê li êvariya Newrozê me tayêrên turumbêlan li ser banên dukanên pençerçiyan li nizîk pişka navixoyiya Amadaya Çandina Zaxo danîne xwar û û girêl dikirin ber bi girê kevne goristana Ermeniyan ve dibirin û li ser girî dikirine girzên bilind û agir berdidayê û li ber gurrî û têhna wî agirî û dengê sirûdên Babê Elî û helbestên Vehêl Amêdî têhina dilê me germtir lê dihat û em han didayne berxwedanê û Birahîm Xelîl me dikire kelha azadiyê û tirs û gefên sîxur û reşekan kar li giyanê berhingariya me ne dikir û em pitir diazirandîn.. Dîsan wê roja reşa me ji radyoya Montîkarlo reşnûçeyê xatirxwastin û dilrawestana babê mezin Serok Barzanî bihîstî û pirraniya me li pişka navxweyî bi giyanek kurdînî û şoreşgerî bo demê sê rojan mangirtî û Kurdistanê xemla xwe reş girêdaye.. Keser û kovan li nav dilê me de dipengiyan û sikrê girî û nalîn û zêmaran lê peqî.. Demê ji nîvşev pêda destên reşên hovên sîxuran Izet Binavî û Kemal ji nivînka daqutayn û eware kirîn.. Ez naxwazim hemû rûdanan wek filmê sinemayê bidim

Berçavên kamîrê.. Çikû rûdan bi çend peyvekan nahêne ravekirin û

peyv bi tinê gunehbarin di rasta rûdanan de.. Tinê dê vê axînkê rakêşim.. Ax.. Ax.. Heval Mirad, yê tu negeheştiye Miradê.. Xwendingehên te bi zimanê erebîbûn.. Lewra te dixwast bi zimanê kurdî pitir rewan û melevan bî.. Min tu fêrî zimanê kurdî kirî da pitir xûna kurdîniyê mejiyê te av bide û te jî ez fêrî şetrencê kirim, da hunerên cengan pê fêr bibim.. Da ez jî mîna te bîrtîj bibim.. Panava depê şetrencê li bin nêrînên hizir û çavên min û te bû.. Û em diketîne berêk û mejiyê me ji hizirên dî dihate şûştin, û her me hizra xo dinijinî û di herifand.. Vî serbazî dê keme gorî hespî!! Nexêr dê yariya xwe bi cotê fîlan kem.. Da serbazê he ji rêkê vedem!! Ji xwe cotê hespan heger hêrişê bibin ser textê şahî dê şah kûve reve?! Rex jî nikarin şahî biparêzin.. Kiş şah!! Nexêr wezîr zêrevan û xwe gurîkere dê hespekî bikuje û dê hespê dîjî pê bikeve!! Weyla mino. Serbazê henê çawa berokên cengê leşkerê me vebirrî û gehişte armancê û yekser bi pilekê çû serê milekê û bû wezîr.. Ne giring e hema serê şahî bimîne sax. Çikû heger şah bû kiş û mir!! Ma leşkirê wî bo çi ye.. Hema hemû dê xwe bidin destên me. Çendî qurbanî hebin bila hebin, tinê şah bimîne!! Dê li ser pira kiloxe seran derbazî kinarê azadiyê bibe. Birayê Mirad hîngê ez û tu bûn û leşkirê min ne ji tuxmê leşkirê te bû. Yên min spîbûn û yên te reş. Lê niho tu yê çûye cihê tenahiyê, cihê enfalkiriyên beheştî û te ez hêlame di vê panava mezin de û ez jî niho

serbazekim li ser depê vê şetrenca mezin, lê her dû leşkirên me spîne û tuxmekin û tevlîhevin û şetirenca me jî xwînelo û enfalawiye.. Û leşkirê reş jî xinêka wane û devê wan qaçekê beşe.. Hîngê ez û tu yarîzanbûn.. Lê îro yarîzanên vê şetirincê biyanîne!!

Li Pira Delal dûr ji hemû tîtalên hunerên cengî yên te ez fêrkirîm Mirado pirtên gelek delalan li ser ban û cade û pir û nav destên zarokan xirvekirin, binçalkirin û ew Birahîm Xelîlê me lê dikire Newroz û berxwedan niho yê bûye

derazînka egerên malwêraniyê.. Û behêviyane û rondikên wê Dîcle kire Tofan û sirûda şehîdan bo tevaya mirovîniyê got û Şernex li gel semfoniya Cudî lê vedigêra û digotin:

Kûnê me çiqas mezine Cihê tev kurdan li bine)

Ew kûn papora nûhiye Yên siwar nebin bo çine)

Min deftera bîrhatinên Amadeyiyê vekir.. Demê min xatira xwe xwastî û min bi nihênî ve gotibû te dê bibime Pêşmerge te jî dixwast em biçîne Kulîca Çandinê li Silêmaniyê.. Rondikên min deftera bîrhatinên min ter kir demê min berperên te xwendîn, demê te berî hevde salan lê nivîsî:

(Bi navê xwedayê mîhireban û bexşende

Qelem yê li destê min da dilerizît, ez neşêm binvîsim çunke tu dê min hêlî û ev axivtine dîmahîka axivtinêt xweş ewêt me li gel yek dikirin li êvariya demê em diçûyne Çayxanê û demê em diçûyne mizgeftê her wesa me diviya em bigehîne yek li Kulica Çandinê li Silêmaniyê çunke mirada min û te eve ye.. Demê hizra hevalîniya te dikem.. Eger zistanbît dê li min bîte bihar, eger tarî bît dê bîte ronahî.. Çunke hevalîniya te li biharê xweştir bû û li stêra geştir bû û li nêrgizan û gulêt çiyayêt Kurdistanê ciwantir bû.. Demê xatira xwe li min dixwazî bawer bike dê bihujim wekî befirê li serê çiyan û dê rondikêt min bihên wekî baranê: Bes! Li ser hindê re min divêt ew roj bîte dergeh bo paşerojeka xweş û şadî demê dibînim! Tu yê bi her dû destan xebatê dikey bo pêşkeftina welatê me yê xweştivî.. Leş têne berzekirin belê wêne û yadigarî nahêne berzekirin.. Hêvîdarim li rêza xwe derbiçî li gel hemû hevalêt xwe..

Birayê te/Miradxan Cangîr10/04/1979)

Belê.. Hevalê şehîd Miradxan te xwendina xwe li Kulîca Çandinê li Silêmaniyê bire serî.. Lê ewrên reş tu enfalkirî mîna te li nav nama xwe de amaje pê daye û nivîsî "*leş têne berzekirin, lê bîrhatin û name û wênên te her li berçavên minin.*". Dîsan demê te nivîsî "*demê te dibînim! Tu yê bi dû desta xebatê dikey*" belê viyana te bi cî hat.. Min bi destekî xame û bi destê dî tiveng bo xebatê helgirtibûn û helgirtîne.. Evca tena binive.. Gul û nêrgizên çiyayên Kurdistanê di destên min da nin û gorê te li gel gorên enfalkiriyan nediyare da li ser denim!!

Nama şehîd Miradxan Cangîr li nik min maye.*